

"EM" VÊN XAPANDÎ

İsa Tahir

**XWANDINEK DI
ÇÎROKA "XWE ÇÛÇIK
JÎ ME DIXAPÎNIN" (1)
VA ÇÎROKNIVÎS
VÛNIS EHMEDÎ**

Bi dîtina min, deqê afirandî, çi edebî be an hizrî... li ber xwendinên cuda cuda yê vekiriye; ne bi wê ramanê tinê ku her yek ji me xwendinek neguhor ji bo deqekê destnîşankirî heye; belku heta wê radeyî jî ku dibe her yek ji me xwendinên cuda cuda bo deqekê li demên ji yek cuda, an di serûberên derûnî yên ji yek cuda de, hebin. Bi ramanek din, xwendina min ya evro bo deqekî dibe ji ya saleke din bo heman deqî ya cuda be, an her yekeke din a demî, çi ya kurt çi ya dirêj. An xwendina mirovî di serûberê derûnî yê destnîşankirî de ji yê serûberê din ê derûnî yê cuda be. Dibe her ev be, egerê wê çendê, deqên afirandî hemû dem û zemanan, xwendinên cuda cuda jê re diên kirin û bi wê yekê, jiyê wan nûjen dibe û carek din xwe di himbêza me de dibînin. Li pey vê dîtîne ramana her deqekê ji aliyê nivîserî

ve, ne yê qalibdayîye û her xwendineke cuda ji dîtina nivîserî, ne xwendineke bê raman e. Ez dibînim nivîserê deqê, demê xwendineke cuda ji xwendina xwe dibîne, carek din û bi awayek din, deqê xwe nas dike. Bi kurtî: Heger em dîtîna û ra û bûcûnên cuda cudayên siyasî û hizrî qebûl bikin, divê em dîtînen cuda cuda bo deqî, pitir qebûl û himbêz bikin. Dibe ev dîtina vekirî bo deqî, vejena jîwarê siyasî û civakî yê cihanî be, evê rijdiyê li ser wegirtina ra ya cuda dike.

Xwendina min bo vê çîrokê, xwendineke vekiriye, di çu qalibên mezhebî yên rexneyî de, ne ya çarçûvekeriye. Ev jî wê yekê nagehîne ku vê rexnegirtinê, şarezayî di hemû an gelek mezhebên rexneyî de heye, ez dibînim, çarçûvekirina xwendinê di yek mezhebî de, dibe cûn e qeydekê bo mirovî çê bike û bargiranî bo deqî çê bibe.

Navenîşan:

Navenîşanê her babetekê, heta radeyekê, derbirînek ayekser e ji naveroka babetî, dergehêk e mirov pê biçê di nav avahiyê deqî de, lê rolê serekî û herî giringê navenîşan pê radibe, cidayîkirine, bi navdananê, cîhana takeyiyê, cîhana taybetiyê, dest pê dike. Merem ji navdanana tiştan ew e em tişt û kesan ji yek cuda bikin, da taybetî û takeyî ya xwe wergrin, da di nav giştîyatiyê de nehelin û nebihjin, ji ber vê çendê em ê ji navenîşanan dest pê bikin.

Ez venaşêrim, min çend hizra xwe di navenîşanê vê çîrokê de dikir “xwe çûçik jî me dixapînin”, min pitir hest bi tirs û têkdanek derûnî dikir. Ez dibêjim: “Ez” ji ber ku min hest dikir, ez jî “ez” ê kim ji wê “me” yê, ev a di navenîşanê de. Ev “me” ye ev a min û te û her kesekê vî zimanî (zimanê kurdî) dizane, digire.

“Em” an “me”, her du cihnavê kesê yekên e di haletê komê de, ev (me) ye di metirsiyek mezin de ye ji ber ku ya di xapandinek berde-wam û reha de.”Em” di vê hevokê de, ev a bi awayê rastiyeke reha hatiye darijtin, ji hemû sîma û saxletên pozîtîf hatiye rûtkirin, tinê yek sexleta negatîf daye pal (me), ew jî xapandine, ev a (yên) din li “me” dîkin. Li vê derê “em” bi rolê berkarî radibe, “yên” din bi rolê bikerî radibe, bi ramanek din, “em” li vê derê bi kêr çu naên, ji hindê pêvetir ku em bêne xapandin, hebûna “me” tinê ji ber wê çendê ye daku ji aliyê “yên” din ve bêne

xapandin “em” rû yê dine yê bi karê xapandinê radibe, heger “em” neyên xapandin “yên” din jî pesna xapînokî wernagire. Ev xapandina “em” tê de, xapandineke sade û ya demdemî nîne belku kûr û berfireh e û ji aliyê demî ve jî, her sê deman yê “borî, niho û diêt” bi xwe ve digire, yê ev xapandine hosa berde-wam û reha kirîn hindêk alavên zimanî e, ew jî ev in:

Xwe (2): ya ji min ve, “xwe” di vê hevokê de, wek tîpek pêwend (her etîf) li kar e. Her weku em bibêjin: Hemû me dixapînin xwe çûçik jî, anku li vê derê “xwe” karê xapandinê, nade pal çûçikan bi tinê, belku dide pal “yên” din jî. Ev “Xwe” ye, aliyên bi xapanadinê radibin berfirehtir û mezintir dike, her kesekê ji dervey (me) digire. Zêdebarî wê çendê, ya ji min ve, (xwe) li vê derê bi karê dupatîyê jî radibe, ji berku em dişên jê bibin bê ku hevoka me wateya xwe ji dest bide. Em dişên bibêjin: Û çûçik jî me dixapînin.

Jî: Ew jî, ji tîpên pêwend e. Wek em dizanin, tîpa pêwend karî dide pal pitir ji alekî, demê em li vê derê dibêjin: Xwe çûçik jî me dixapînin, anku ji bilî çûçikan jî, aliyên din jî hene bi karê xapandinê radibin, hosa “jî” karê xapandinê berfirehtir lê dike û ji çûçikan bo aliyên din dibore.

Di: ev “di” ye, nîşana (pêşgîre) karê neboriyê berde-wam e, ev “di” karê xapandinê berde-wam û reha dike, rehendên kûr ji xapandinê bi xwe ve digire. Ev “di” ye, demê borî û niho yê diêt, her sêkan di-

gire, anku “em” bi dirêjîya hebûna xwe, çî demê borî çî yê miho çî yê diêt, jî aliyê “yên” din ve diên xapandin û çu demên din ne berçav in,”em” tê de rizgar bibin.

Zêdebarî wan alavên zimanî yên ev xapandine wesa berdewam û reha kirî, helbijartina giyandarekê wek çûçîkê ku navenîşanî kiriyara xapandinê dayîye pal wê, ev çende jî alîkar e, ev xapandine, kûr û mezin be.

Çûçîk li dev me, nîşana sivikî û biçûkî û kêmaqilî ye, çûçîk ew giyandare ye eva bi sanehî dikeve tepkan, ew e ev a jî mamikan(3) ditirse û newêre xwe nêzikî derametê çandinê bike. Demê giyandarekê hosa sade, bişê “me” bixapêne, ev wê çendê digehîne, xapandina “me” du carî ye, her wesa wê yekê digehîne, “em” jî aliyê şîyanên eqlî ve, jî vî giyandarî kêmtirin, bi vê yekê çûçîk jî, alîkariya wan alavên zimanî dike ku “em” pitir di bazneyekê heta hetayî yê xapandinê de bin û çu caran, jê dernekevin.

Bi kurtî: “em” di ((Xwe çûçîk jî me di xapînin)), “em” e ke çu hêz û şîyan nînin, hebûna wê tinê di xapandinê de berceste dibe, berkare ne bikere, jî rexê hemûyan ve diên xapandin, ev xapandine, berdewam û rehay e. Me vegeryanek din jî ji bo navenîşanî heye, lê piştî em bi nav avahiyê deqî de diçin.

RÛDANA HERÎ GIRING, RASTIYA BÊGOMAN

Rûdana herî giring, eva avahiyê çîrokê pêk diîne, dadana refek a çûçîkan e di nav hewşa xêzanekê

de, ev rûdan e, li dor hindêk bîrûbawerên kevin ên miletê kurd, nîşana hatina mêvanan e (4). Ji berku evê xêzanê, bawerî bi wê çendê heye, bi berhevkirina xwarinê ji bo wî mêvanî radibin, evê çûçîkan, mizgîniya hatina wî bo xêzanê ragehandî. Piştî xweberhevkirinek baş, mêvan diyar nabe û nayê. Li vê derê, hatina çûçîkan wek eger (sebeb) û hatina mêvanî wek encam (netîce) hatine hizirkirin. Hevbendîya di navbera egerî û encam îde, heta berî şîrovekiririna felsefiya Dîvîd Hiyom 1711-1776 z, ji bo eger û encaman, wesa didîtin ku ev hevbendî ye a pêdiviyê her weku tu bibêjî, encam ji hundirê egerî derdikeve, anku heger eger nebe, encam jî nabe. Hiyom bi vê yekê razî nebû û bi şîrovekirinek felsefî rabû. Gehişte wê encamê ku çu hevbendiyên wesa pêdivî nînin û encam ji egerî çê nabe û tiştê ev hevbendîya hosa di hizra xelkê de çespanî, tinê ew e ku du rûdan li dû yek re diên û biborîna demî, xelkê wesa hizir kiriye, rûdana duyê ji ya yekê çê bû ye, her çende xwe hatina her du rûdanan jî (hatina çûçîkan û hatina mêvanan) li du yek re gelek bi zehmet e. Lê di vê çîrokê de wek rastiyeke bêgoman û rûdaneke hergiring hatiye berçav kirin, giringiya evê rûdanê li dev endamên evê xêzanê di wê çendê de aşkera dibe, demê em dibînin, serûberê her yek ji endamên xêzanê di demê çêbûna rûdanê de, bi hûrî, hatiye wênekirin.

((Çaxê ez yê peyt da dergêhî li

dûv xwe hêlim, di wê geha kurt û hur de refeka çûçika di hewşa me de dadan û berdane wîç wîçê)).

“...ez li ber derîzînkê bûm.”

“...ez veciniqîm, mawekê kurt mame li benda mendehoşiyê.”

“...deyîka min êkemîn kes bû ji xêzanê dengê ter û nazik bihîstî.”

“Aman ji destê deyka min verestî.”

“Babê min gaveka wî li jor ve bû û ya dî ji nwî dana bû ji derve.”

“Babê min wekî mirovekî li jêr pêlên xewnê li dor xo zivirî.”

“Birayê min ji bin nivînka xwe helavên.”

Ev pesna hosa hûr, ji bo serûberê kesatîyên çîrokê, di wê geha çûçikan di hewşê de daday, nîşana giringiya rûdanêye, wesa diyer e, ev bawere di ne hişê endamên vê xêzanê de, ya çespayî û cihgir e û çî goman li ser nîne.

Her ev bawerye ye, endamên xêzanê pal dide, bê nexşekêşan, bê pilaneke pêşwext, bi hev re kom bibin, da bibêjî, eve ji mêj were li benda evê rûdanêne, eva xweb-erhevkiyê baş bo divête.

Bi ser pilî...bê nexşekêş em xirbûn, rawestiyên beramber êk û du û li çavên hev nêrîn.” Her wesa demê dayik mizgîniya hatina mêvanî bi wan re digehîne, kes ji endamên xêzanê gengeşeyê li ser rastî û nerastîya wê çendê nake, tinê ew nizanin ka kî ye.

((Eşeh evro mêvanek dê bo me hêt...ev mizgîniye di gel çûçikan ya hinartî.

- Babê min pirsî?

- Dê kî bitin?

Me jî got:

- Dê kî bitin?

Dayîka min got:

- Fere pêşewaziyeka hejî bo wî danîn.

Babê min dubar e kir:

- Dê kî bitin?))

Ev bawerî ye, pitir berceste dibe, demê ev xêzan e bi karê xweb-erhevkiyê ji bo hatina mêvanî radibin.

((Berî nîvro teklîfeka berfireh me amade kirbû ji hemî reng û bêhn û tama.))

((Wek tîmekî me karê xwe pêkîna, ode, hewş, derazînk me şwîştin, me gulav li hemî rexa raêxistin. şemalk helkirin, me dîwar û qulaç xemilandin.))

ÇÛÇIK Û XAPANDIN

Kes ji me, çu peyaman û rêkevtin di gel çûçikan girênedayîne, çî demê di hewşa yek ji me de dadan, divê di dû re mêvan bîn û çî demê mêvan nehatin, em bibêjin:oho çûçikan em xapandin an xiyaret li me kir. Di çîrokê jî de, çûçikan çu rêkevtin di gel vê xêzanê girênedaye, çî demê ew hatin di hewşa wan de, divê li pey wan mêvan bo wan bîn, li ser vî binyatî, çûçikan ev xapandine ne kiriye. Anku çûçik ji kiriyara xapandinê dûrin. kesê endamên vê xêzanê xapandîn, dayîk bi xwe ye.

DAYİK, DESTHELAT Û XAPANDIN

Ev çîrok e li ser zimanê kesê yekê yê tak “ez” hatiye vegêran, di gel evê kesatîyê, dayik, bab û bira ye kin. Kesatîya ji hemûyan giringtir û balkêştir, kesatîya dayîkê



vê çîrokê de, dayîkê desthelatek mezin heye. Ev desthelat e ji desthelata wê ya meirifî dihêt. Ewe ev a, egerê dadana çûçikan di nav hewşa malê de dide xuya kirin ku nîşana hatina mêvana ne, her wesa ewe ev a, fermanan dide endamên din yên xêzanê, her yek bi karê xwe rabe: ((Deyîka min bi baweriyeka mûkûm axivît.

- Eseh evro mêvanek dê bo me hêt. Da baweriya me qayîmtir lê biketin gotî:

- Ev mizgîniye di gel çûçikan ya hinartî.))

((Dê hêtin, min bawer e me nahêlîtin di vê bêzariyê de.))

((Em şepilîn wek serxoşa li dor êk zivirîn, dengê deyîka min em ji vê aloziyê rizgar kirîn, birwîsiyên firmana li dûv êk hatin vedan...))

Her çende, ferman, di evê parçeya borî de, ya dayîye pal bikerê nediyar lê ji siyaqê wê diyar e, ew ferman e yên daykê ne, rast e pesna evan fermanan bi birûsiyê delaleta lezatiyê dide, lê di heman dem de, delaleta xurtî û dijiwariyê û desthelata dayîkê jî dide, ji berku herçende birûsiya bi lez e, lê her wesa mirovî disojîne jî.

Ev desthelata dayîkê heyî, wek me gotî, ji desthelata wê ya meirifî ye, ev jî wê rastiyê dupat dike, eva dibêje: Meirife desthelat e, ev meirif a dayîkê heyî, pitir di çarçûveyê birûbawerên kevin de dizivirin, (hatina çûçikan nîşana

hatina mêvana ne.) Anku dayîk li vê derê bi erkê belavkirin û qayîmkirina birûbawerên kevin radibe û li pey wê meirifê, desthelata xwe disepîne. Bi vê yekê dayîk e ya wan birûbawerên kevin, careke din, di mejiyê xêzana xwe de diçespîne. Li vê parçe ya diêt binêre, ka çawa dayîk hêviyan di dilê xêzana xwe de diçîne ku piştî hatina çûçikan, hatina mêvanî ya misoger e: ((Dê êtin ... dara xewna, ewa bi omêdên vê malê werar bûyî evro dê fêqî yê xo ditin, em li ser merema wê helbûyn. Dengê wê em têgehandin ku erkekê nayab dikevite ser me.)) Heta demê ev xweamadekirine ji bo mêvanî, dibe cihê sivikatiyê ji aliyê cîranan ve, her dayîk e bersiva wan dide: ((Bi tamsarî û sivikatî pirsîn:

- Eve çi qewmiye?

Dayîka min bersiv da:

- Ma hwîn nizanin?

- Na!!

- Evro... çwîçikan mizgînî li hewşa me de gêrand)).

Li vê derê pirsyarek heye: Erê dayîkê çawa hosa bi sanahî şiya endamên xêzana xwe qayîl bike û baweriyê bo çê bike ku hatina mêvanî çi goman tê de nine, lê pey hindê bixapîne?! Bi dîtina min, du eger, alîkarin ev xêzan e hosa zû baweriyê bi wê çendê bîne û bêne xapandin. Ew jî ev in:

1-Ev birûbawer e (hatina çûçikan nîşana hatina mêvanan e.) di nehişê endamên evê xêzanê de,



ya cihgîr û razayîye, ji ber wê yekê jî, piştî dadana çûçikan di nav hewşê de, êkser û bê nexşekêşan kom dibin. Ev kombûn e wê çendê diyar dike, ev rûdan e ne rûdaneke sade û herhoye, belku hindek tişt yên di dû re.

2 – Serûberê vê xêzanê yê derûnî: Hestkirina evê xêzanê bi pêdivîhatina mêvanî gelek diwar û zîq e (5), bi peyvek din, mirov hest dike, ev xêzan e ya di serûberê ne asayî yê derûnî de, di sîstemekê rotînî û pengiyayî de dijît û guhartina vî sîstemî tinê di hatina mêvanî de, dibînin: ((cara êkê ye gef li sîstema jiyana me di-hête kirin, keyfxoşî ... keniyên zelal, lêborînî, di nav me de peyda dibin.)) Her wesa awayê çaverêkirina mêvanî, wesa xuya dike, hatina mêvanî ne pêdiviyeye herhoye, belku pêdiviyeye herîgiring e: ((hestên me bi dem-jimêrê ve mane helawîstî. Dergehê hewşê me hêla vekirî, babê min rawestiya li ber dergehî, çavên wî li rê yê, ez çûme serbanî bo zê-revaniya rêkê.)) Ev pêdiviya wan ya mezin bi hatina mêvanekê, ya wel wan kirî, her tişteke hebe ewê omêdê bi cih bîne, her zû baweriyê pê bînin. Ew her du egerên borî alîkarbûn, endamên evê xêzanê bi sanehî, ji aliyê dayîkê ve bêne xapandin.

CAREK DÎ NAVENÎŞAN

Xwendina me, ji bo vê çîrokê, em gehandine wê rastiyê ku yê bi karê xapandinê radibe, ne çûçik in belku, dayîk e. Navenîşanê çîrokê, çûçik bi karê xapandinê gunehkar kirîne, helbet, ev navenîşan e wek encam hatiye berçav kirin, anku piştî çîrokvegêr çîrokê bi dawî diîne, digehe wî encamî ku çûçikan ((em)) xapandine, ev encam e kiriye navenîşanê çîrokê. Heger em xwe, xwe qayîl jî bikin ku çûçik in bi xapandinê radibin, diviya darijtina vî navenîşanî hosa neba. Çîrokvegêrê û li dû çenda borî, diviya navenîşan hosa darêjtiba: Çûçikan em xapandin. Ev darijtin e, kiriyara xapandinê tinê dide pal çûçikan, her wesa vê kiriyarê ji demê borî dernaxê, anku her du demên din (niho û yê diêt) venagire. Lê navenîşanê çîrokê, wek me diyar kirî, tinê çûçik bi kiriyara xapandinê ranabin, her wesa her sê deman; (borî, niho û yê diêt) bi xwe ve digire, anku xapandin reha û berfireh û berdewam e. Pirsyar li vê derê ev e: Erê ew çi egere wel çîrokvegêrê kirî, evî navenîşanî dane? Bi peyvek din, çima çîrokvegêrê amaje daye pitir ji aliyekî ku bi kiriyara xapandinê rabûyne, ew jî bi rêya bi karanîna herdu alavên zimanî (xwe) û (jî)?

Ya ji min ve û bê mirov ji hundirê deqî derkeve, dê bibêje: Egerê çîrokvegêr paldayî evî navenîşanî



dane, tirs e ji desthelata dayîkê, çîrokvegêrî newêryaye bi aşkerayî bibêje, dayîkê em xapandin, belku tinê çûçik yên aşkera kirîn û bi awayekê veşartî amaje yê daye aliyek din ku ew jî bi kiryara xapandinê rabûye, helbet heger em bên û bi pirsin, ka egerê vê tirsê çi ye? Deq bi xwe çi tiştê aşkera nake di destê me de. Lew em dê-bibêjin: Ev tirs e, tirs desthelata meirîfî ye., desthelata bîrûbawerên kevin, eva evê xêzanê an miletî, xwe jê rizgarnekirî û her ji ber hindê ((em)) diên xapandin. Li dawiyê xwendina xwe bo vê çîrokê, dibêjim: Heger carek din, navênîşanê vê çîrokê((em)) binivîsin, bê tirs ji desthelata dayîkê, divê bi vî awayî bête nivîsîn: (Bîrûbawerên kevin me dixapînin.)

DEHMEN Û PERAWÊZ:

1- Çîrokek e ji koma çîrokên (Lê lê weso)

2- Li vê derê heger(xwe) li şûna (xo) bihata bi karanîn, baştirbû, ji berku (xwe) wek deng, bo guhê mirovî bihêztir e û vê rastiyê jî (rastiya xapandinê) pitir di hişê mirovî de diçespîne. Her wesa (xwe) bi wataya (zat) jî pitir ji (xo) dengê kûratiyê û hundiriyê dide. Bi peyvek din, mirov hest dike (xwe) pitir diçe di nav xwe de anku pitir nêzîkî wataya (zat)e. Berevajî (xo), mirov hest dike bo

guhê mirovî ya serberday ye û li ser hêlek rast diçe.

3- Mamik: Ew helamet e, evê xwedî yên derametê çandinê, wek wêne yê mirovan çê dikin bi darekê ve dikin û li nîva derametî de diçikilînin da çûçik û balindeyên din ne êne nav.

4- Hindek serûberên din jî hene, ew jî li dû wan bîrûbaweran, dibine nîşana hatina mêvanan, wek:

a- Demê jinik hevîrî dikin û hindek pirtkên hevîrî ji nav tilên destên wan derdikevin, dibêjin: Mêvan wê bên.

b- Demê difna mirovî dixwere.

c- Demê serê zarokan şeh dikin, an mirov serê xwe şeh dike û şeh ji destê mirovî dikeve.

d- Demê zarok dest diavêne gêskî û malê dimalin, dibêjin: Wenekin, mêvan dê bo me ên.

e- Demê kitik destê xwe bi serûçavên xwe de dibe û diîne.

f- Heger zilkek kevte di çaya mirovî de.

g- Heger ça zêde kelî û tovça biserket.

h- Heger lewendiyên mirovî vebûn.

Binêre: Bîrûbawerên kevin di nav miletê kurd da, Beyar Bavî, rûpel (8 -9-11-17.)

5- Ev jî pêdivî xwendinek dine.

